"TKP'nin Sesi" 12.6.1983 Pazar

Bu yayınımızda şunları dinliyeceksiniz:

1. Atılım'ın Haziran sayısından iki yazı: " "Yeni durum" ; "Halkımızın yazgısını değiştireceğiz"; ve bir şiir: Llegal çalıxşmaya övgü" /Spk: N. ve Tah./

2. Kürtçe yayınımızı (Şerf.)

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

12-6-1983 Şeri

TKP'nin Sesi
Kürtçe
Konu: Komkar'ın bildirisi ve Irak Kürdistanı'ndaki operasyon, İsrail'in açıklaması ve burjuva basın yayın organları

...........

Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan li Elmanya Federal ku bi navê KOMKAR têye nazkirin, bi weşandina belevokek êrîşên Leşkerên Tirk li Kurdistana Iraq'ê mehkûmkir. Di belevoka Komkar da tête kifşkirin, pêşmerge hemberê êrîşkaran bi mirandvarî berxwedidin, û li wê derê gelek mirî û birîndar hene. Komkar belavoka xweda bona mehkumkirina êrîşa han gazî kedkirên Tirk û Kurd dike. Hemberê minavreyên Ekspresa Serborî sala 1983 jî Komkar di belawoka xweda deng bilind dike û kifşdike ev minavre ~~xxxxxxxdike~~ berê pêşin Yekîtîya Sovyetîyê, hemberê welatên cînar têye pêkanîn. Li rojhilata navîn hemû tewgerên pêşwerû û dij-emperyalîst pêşbir digre. Belavok bi halana bijî pişgirîya navbernetewî davîdibe.

TÜSTAV
TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

RASTÎ U DEREV: WÊ KÊJAN BÎBE SERFÎRAZ?

Waxtê cuntakar leşkerên xwe ajote ser Kurdistana Iraq'ê,rojnameyên biboyax jî muxabîrên xwe şande tuxubê.Jivana Seroka buroya Dîyarbekir ya Hurrîyet ~~xxx~~ Talat Polat,dîsa muxabîrê vî rojnameyê Remezan Pamuk bi otomobîla muxabîra Millîyet Ertuxrul Pirinççîoxlî dajot ~~xxxxxxxxxx~~ wergerîyabûn ber bi Şirnaqê rastê otomobîlek din hatin.Ev otomobîl çepê wan diçû.Hundurê wîda jî ji Millîyet Savaş Ay,ji Hurrîyet Saygı Özturk û ji Yenî Asir Eren Guneş hebûn.Ew dixwestin biçine Uluderê. Ev rojnamekar hevalên xweyê diçine Şirnaq'ê nazkirin,û bona ji wan hinare bistînin hêdibûn. Lê ewêdin çima otomobîla din hêdî dibe bişikbûn. Muxabîra Ertuxrul Pîrînççîoxlu bi peyvên "heywaxxx Pêşmerge" qêrîya û lezkiri ajot çû.Ē din dixwestin ji hevalên xwe hinek tişt hînbibin,bona vî zivirîn dane pey van.A-

TÜSTAV TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

hakî rojnameker ji rojnamekaran ça ji Ezraîl direvin ussa revîyan. Ev revîn û peyrevîn heyya Şirnaq'ê dombû.Bereket li serwan rêyên xirabe, ji van otomobîlan yek, ji semedê koşa hundurê tarîyêda hate pêkanîn nebû gorîn. Ger qezayek aha pêkbîhata bê şik ev jî li stûyê pêşmerganda bima.

Mirov bûyera han hîndibe qasek li ser diponije.Ev rojnamekar ji rastî evqas ditirsin? Gelo semed çîye ev rojnamekar ewqa ditirsin, dest û milê wan diricife? Ji van jî giringtir, ev rojnamekarên dibêjin "pêşmerge" û ji hevîdû ditirsin direvin paşê, ji hêramê bi rojan hinareyên derev şandine rojnameyên xwe.Çîye,pêşmerge tirs berdane ser hêramê!Çîye,anarşîst ji gel xeraç distînin.Çîye,pêşmerge zevîyan didine ber agir. Gişk jî pêşajotinên bê delîl û derev...

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV

Waxtê em xwe mirovek ji rêz dihesîbînin û diponijin,wî demê fehmdikin,ev qutûta rojnamekaran ku hemberê Kurdan hildidin, durustîyê daynine alîyek,anora rojnamekarîyê jî davêje bin lingan.Ev bi hemû xwendevanan tiranê xwe dikin,heqeret dikine wana.Bi zanîyar bi zanîyar hinareyên şaş didine xwendin.Tu rojnamekarek anora rojnamekarî hundurê xwe de dihesibîne nikare li rêyek aha bimeşe.

Hinek muxabîr li rêyek aha dimeşin,Teoman Erel ji xeterîya İsrail behsdike.Kifşdike bona bigîhîjine armancên xwe sîyonîstên İsraîl amadene ji hemû tiştan,ji hemû keysan kêrbibin.Ev dîtinên ku hundurê nivîsa "Lêpok na,vehîm" têye eşkerekirin ji dil raste. Lê belê tenê alîyek rastîya nîşankirin têrê nake.Kê hemberê sîyonîstên İsraîl tekoşîna herî bi biryar didomînin? Gere bersiva pirsa

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TUSTAV

han jî were dayîn.Berê pêşîn Komunîstên Kurd ku li welatên xwe hundurê Partê Komunîst xwe dihonînin,hemû komelên Kurdên Welatparêz û dij-emperyalîst bona perçiqandina sîyonîstên İsraîl bi salane beramberê hêzên pêşwerûyên din mil didine milê gelê Filîstînê û tekoşîndikin.Lewra,ewana hundurê şeran da hîndibin emperyalîst û hêzê êrîşê ~~ya~~ emperyalîstan Sîyonîst nabine hevalbendên gelan.Ew dibînîn yên ku polîtîkayên ne partîya Kurd didomînin pişt~~didine~~a xwe dane emperyalîstên YDE.Ew gelek baş dizanin hingê hemberê emperyalîstan neyê tekoşîn kirin,hingê li hêram nîra emperyalîst neyê işkandin gîhîştina azadîyê pêknayê.

Lê,li Tirkîya'yê hinekên dibêjin "İsraîl bi reşa rûyê xwe ziman dirêjdike Tirkîya'yê" û ~~hêrsdibine~~ xwe çij dikine ser İsraîl,cuntakaran bê sosret nîşandikin,ji vana çend kes ji dil hemberê sîyonîstên İsraîl şer-

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI

didin? Çepê vî yên ku li Tirkîya'yê piştdidine Îsraîlê,hemberê Kurdan jî neyartîya herî mezin didomînin.

Waxtê ev rastî ahakîne çima Dengbarê şixwulê der ya Îsraîl'ê İzak Şamîr gotîye "Rêbirinên Tirkîya'yê û Iraq'ê Kurda diperçiqîne" rastîya perçiqîna Kurda naguhire.Kêr nîne ji semedên gotina wî Kurd ji daxwezîyên xweye biheq,daxwezîyên azadî û wekhevî bihevin.Çima Sîyonîst dixebitin hundurê Kurda ji xwera hevkar bibînin,biheqîya daxwezîya azadî û wekhevîya gelê Kurd undanabe. Ça çem bi a wexwarina seyek naherime....

Kurd biheqin.Ew bona heqqên xweye herî bingeh ya mirovkî derbâsê destê xwe bikin tekoşîndikin. Gotinên "Pêşmergeyên li Kurdistana Iraq'ê an jî yên li cîyek din Tirkîya'yê hildidine bin gefan" lêpokin.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI
TUSTAV

Şixwula li Tirkîya'yê were pêkanîn tuxuban buhurîn û hemberê Kurdan qirkirinek bi sedan pêkanîn nîne,Boha Kurdên Tirkîya'yê heqqên wekhevîyê û azadî nazkirin,zordestîyên ser wana davîkirine.Xênc jî vî tu pêkanînek xwedanê ~~wanî~~ dîwarojan nîne.Ji vî semedê vatînîya dikeve ser roğnamekar û nivîskaran,gere nebe vatinîya bi tirsên şovenîst derevan weşandin ~~nînn~~ û,rastîya sere-berjêr kirin .

~~Bûyîna~~ kê dibe şirîkê sosretên nejadperest û şoven vebalên giran hildide ser piştê ~~kirine~~ tê cwe.Em bîrnekin!Tucar nehatîye dîtin derev bibine serfiraz.Derev nikarin bibine serfiraz.

TÜRKİYE SOSYAL TARİH ARAŞTIRMA VAKFI TÜSTAV